

Rêzimanên kurdî
û
termînolojiya wan ya zimannasiyê

Îbrahîm Seydo AYDOGAN
INALCO
Paris

Rêzimanên kurdî û termînolojiya wan ya zimannasiyê

Îbrahîm Seydo AYDOGAN

INALCO-Paris

Ji bo naskirina zimanekî, mirov berê li rêzimanên wî zimanî dinihere. Lê belê, gava ku mirov bala xwe dide rêzimanên kurdî yê zaravayê kurmançî û metodên fêrbûyina vî zaravayî, mirov di cîh de dibîne ku di binavkirina têgehên zimannasiyê de lêkolîn û xebatên ku heta niha hatine kirin, li hevdu nakin. Sedema wê, bêguman, nebûna perwerdehiya kurdî ya giştî û tahrîbatên qedexeyên salan in. Lewre, heger perwerdehiya zimanekî nebe, gihandina zimannas û rêzimannasên wî jî dê bi awayekî bêserûber pêk were. Ji ber wê, gava ku termînolojiya wan jî cuda be, di têgihîştina ji hevdu de pirsgirêkên ciddî dikarin derkevin pêşiya zimannas û rêzimannasên kurd.

Termînolojiya zimanekî, weke alfabeya wî, xwe dispêre lihevkirineke giştî û ev lihevkirin li ser bikaranîna hin peyvan ya ji bo hin têgehan e. Lê belê, ji ber ku zimannas û rêzimannasên kurdî di heman pêvajoya perwerdehiyê re derbas nebûne û referansên wan ne yek in, bivê nevē, tercîhên wan yê peyvan yê ji bo têgehên zimannasiyê jî dê ji hev cuda bin. Weke nimûne, îroj di nava xebat û lêkolînên li ser kurdî de, ji bo peyva *superlatif* ya inglîzî bi kurmançî şeş pêşniyar hene ku carinan ji hev gellekî dûr in : *berhemîn, serekanî, payeya bilind, berztirîn, pîleya herî raseriyê, lapekemper*.

Em bibêjin ku peyva *superlatif* peyveke taybetî ye, lê belê têgeheke zimannasiyê ya hêsan jî dikare bikeve heman rewşê. Ji ber wê ye ku ji bo peyva *object* ya inglîzî, bi kurdî çar pêşniyar hene : *bireser, serve, pêger, tişte*.

Heger rewş ev be, êdî her rêziman li gora xwe zimanekî nû ava dike, lewre gava ku peyv cuda bin, têgihîştina ji hevdu jî ne mimkun e. Ji ber wê, em ê li vira hewl bidin û rêziman û lêkolînên kurdî di warê termînolojiya zimannasiyê de bidin ber hev û encaman binirxînin. Lê belê, dîroka zaravayên kurdî weke hevdu nebûye û ev yek dikare bibe sedem ku hin çavdêriyên zaraveyekî ji bo zaraveyekî din ne rast bin. Ji ber vê sedemê û bi xema homojeniya xebata xwe, em ê li vira bi tenê behsa zaravayê kurmançî bikin.

1. Termînolojiya zimannasiyê di rêzimanên kurdî de

Bi armanca zelalkirina pirsgirêka termînolojiyê, em ê di destpêkê de çar metodên fêrbûyina kurdî di warê tercîhên wan yê termînolojiya zimannasiyê de bidin her hevdu. Me peyvên mînak li gora nûbûna wan û hevparbûna têgehên nava berhemana hîlbijartine.

K. BEDIRXAN (1971)	OZEL (2000)	DIRÊJ (2008)	HÎNKER (2009)
lebatî		lebatî	
tebatî		tebatî	
	berevajî-bereksî	dijwate	
berhevda	berhevanî	berhevdanî	hevrukirin
serve	bireser	bireser	
pronav	cînavk	cînav	cînavk
poronavê kesin	cînavkên kesîn	cînavên kesane	cînavkên kesane
daçek	daçek	daçek	daçek
dema paşî	dema bê-pêş	dema bê	
dema boriya têdayî	dema borî-bihurî	dema boriya têdayî	
dema niho	dema niha	dema niha	dema niha
belanî	erênî	erênî	
gihanek		gîhanek	gihanek
jmar	hejmar	jimar	hejmar - reqem
komek, hevok	hevok	hevok	hevok
	hevoksazî	hevoksazî	
hoker		hoker	hoker
kirde	kirde	kirde	
laperî	xebitandin		kişandin
lêker	lêker	lêker	lêker
lêkerên geranî	lêkerên gerguhêz	lêkerên gerguhêz	
lêkerên ne geranî	lêkerên negerguhêz	lêkerên gerneguhêz	
lêkerên hevedudanî		lêkerên hevedudanî	
rader	mastar-master		rader
		navdêr	navdêr
neyînî	neyînî	neyînî	neyînî
berlêker		pêşgir	pêşgir
dawînî		paşgir	paşgir
pirejmar	pirejmar-pirjimar	pirjimar	pirjimar
	qertaf	qertaf	qertaf
rawe		rawe	rawe
raweya pêşkerî			
raweya bilanî			
raweya gerfînî			
raweya fermanî			
raweya çêbiwar		raweya çêbiwar	
ra		Reh	rayek
rengdêr		rengdêr	rengdêr
tewang		tewang	tewang
berhemîn	serekanî	payeya bilind	berztirîn
tîpên girdek	tîpên girdek	tîpên girdek	tîpên girdek
tîpên hûrdek	tîpên hûrdek	tîpên hurdek	tîpên hûrdek
tîpên dengdar	tîpên dengdar	tîpên dengdar	tîpên dengdar
tîpên dengdêr	tîpên dengdêr	tîpên dengdêr	tîpên dengdêr
veqetandek		veqetandek	veqetandek
veqetandekên binavkirî		veqetandekên binavkirî	veqetandekên binavkirî
veqetandek nebinavkirî		veqetandek nebinavkirî	veqetandek nebinavkirî
yekejmar	yekejmar	yekjimar	yekjimar

Bi alîkariya mînakên ku ji *Rêzana Zmanê Kurdî* (K. Bedirxan, 1971), *Kurdiya Nûjen* (Ç. Ozel, 2000), *Kurdî kurmancî* (E. Dirêj, 2008) û ji metoda herî dawîn *Hînkêr* (R. Onen, S. Tan, M. Aykoç, S. Varli, 2009) hatine girtin, me hewl da ku em vê pirsgirêkê nîşan bidin.

Li gora tabloya jorê, diyar dibe ku di peyvên bingehîn yên mîna « *hevok, tîp, kirde, rengdêr, hoker, lêker, qertaf, daçek, rawe, dengdar, dengdêr* » de lêkolînerên kurd li hevdu kiriye, lê belê di hin têgehên rêzimanî yên din de li hev nakin.

Di 48 peyvên mînak de bi tenê 21 peyv di nava van xebatan de weke peyvên hevpar hatine bikaranîn. Mirov dikeve wê baweriyê ku lêkolînerên kurd guh nadin hevdu. Ji ber wê ye ku digel ku di hin metodan de peyva *cînavk* hatiye bikaranîn jî, em dibînin ku di hin din de peyvên *pronav* an jî *cînav* hatine bikaranîn. Di eslê xwe de wateya van peyvên her yek e, lê belê heger tercîh xwe li ser bingehê hevpar daneyne, hingê di fêrkirin û fêrbûyina zimanî de pirsgirêkên têgihîştinê dikarin peyda bibin.

Weke mînak, heger mirov qebûl bike ku *qertaf* an jî *paşgira -k'yê* ji bo çêkirina navdêrên nû tê bikaranîn (weke *xwelî-dan-k*, weke *ber-çav-k*) hingê divê mirov peyva *cînavk* jî qebûl bike. Lê belê, heger mirov dijberê wê bifikire, hingê divê mirov peyvên *xwelîdan* û *berçav* jî bi kar bîne ku îroj di nava xelkê de ev form bêtir bi formên xwe yên weke *xwelîdank* û *berçavk* tên naskirin.

Carinan lêkolînerên kurd bi heman helwêsta avakirina peyvê tev geriyane, lê belê helwêsta wan ya binavkirinê ji hev cuda bûye. Ji ber wê ye ku ji bo *koka lêkerê* di tabloyê de sê tercîhên cuda xuya dibin : *ra, reh, rayek*. Ev her sê peyv jî ji *rehê daran* hatine, lê belê heger ji derveyî konteksta zimannasiyê xuya bibin, ne xwedan heman wateyan in. Lewre bi kurdî ji *koka daran* re nabêjin *rayek* û heger mirov *paşgira -yek'ê* nas kiribe, dikare bikeve feqa hevwateran û bibêje qey behsa *rayên trênan* an jî *rayên hîlbijartinê* dibe. Sedema vê tevliheviyê jî ew e ku kurd bi awayekî mecbûrî bi zimanîne din jî dizanin û ji ber naskirina wan zimanan jî ew peyvên ku ji wateya xwe ya naskirî cudatir û bi wateyeke *nû* tên bikaranîn, dikarin bibin sedema têngbûnê. Her bi heman sedemê, *cînavka kesîn* dikare wateyeke weha bide ku gellekî dûrî *cînavka kesane* be. Hingê weha diyar dibe ku heger ferhengokeke taybetî ya termînolojiya zimannasiyê di dawîya van berheman de nebe, zimannas bi xwe jî dikarin ji xebatên hevdu fahm nekin, lewre beyî ferhengokekê, ne mimkun e ku mirov bizane ku *serve* û *bireser* bi heman wateyê hatine bikaranîn.

Ji bo ku em bikaranîna wan peyvên ya di xebatên dawîn de jî bibînin, em ê niha jî bala xwe bidin hin xebat û lêkolînan ku van salên dawîn li ser zaravayê kurmancî hatine kirin. Peyvên mînak dîsa bi heman metodê hatine diyarkirin.

BOZKURT (2008)	BILBIL-BARAN (2008)	ZAL (2009)	KURMANCÎ (2010)
	dançêker		sedemkar
	avaniya lebatî	avaniya lebatî	
forma pasîf	avaniya tebatî	avaniya tebatî	
	dijwate		dijmane
	payeya rêngdêran	kemperandin	kemperandin
bireser	bireser	pêger	tişte
cînavk	cînavk	cînav	pronav (cihnav)
cînavka kesanî	cînavkên kesane	cînavên kesaniyê	pronavê kesîn
daçek	daçek	daçek	daçek
dema wêbê	dema bê	dema bê (dahatû)	dema dahatî (pêş)
dema borî	dema boriya têdayî	dema borî ya têdayî	dema raborî
dema niha	dema niha	dema niha ya têdeyî	dema niho
erênî	erênî	erênî	erînî
gihanek	gihanek	gihanek	gihanek
	hejmar	jimar	jmar – jimar
hevok	hevok	hevok	hevok
	avaniya hevokan	avaniya hevokan	hevoksazî
	hoker	hoker	hoker
kirde	kirde	kirde	kirde
	derb	kirp	
kesandin	kişandin	kêşan	kişandin
lêker	lêker	lêker	lêker
lêkerên gerguhêz	lêkerên gerguhêz	lêkerên gerguhêz	lêkera têper
lêkerên negerguhêz	lêkerên negerguhêz	lêkerên negerguhêz	lêkera têneper
lêkerên hevedudanî	lêkerên hevedanî	lêkerên hevedudanî	lêkerên hevedudanî
rader	rader	rader	rader
navdêr	navdêr	navdêr	navdêr
neyînî	neyînî	neyînî	neyînî
pêşgir/berlêker	pêrkît	pêşgîn	pêşdanî / berlêker
paşgir/dawînek	parkît	paşgîn	paşdanî / dawîne
pirhejmar		pirjimar	pirane
	qertaf	qertaf	
rawe	rawe	rawe	rawe
raweya danzanî			raweya pêşker
raweya hestbarî			raweya bilanî
raweya mercî			raweya hekînî
raweya fermanî			raweya fermanî
			parenga raborî
ra	kok	rayek	reh (ra- rayek-kok)
rengdêr	rengdêr	rengdêr	rengdêr
	tewang	tewang	tewang
		pîleya herî raseriyê	lapekemper
	tîpên girdek	tîpên girdek	tîpên girdek
	tîpên hûrek	tîpên hûrdek	tîpên hûrek
tîpên dengdar	tîpên dengdar	tîpên dengdar	tîpên bêdeng
tîpên dengdêr	tîpên dengdêr	tîpên dengdêr	tîpên dengdar
	qertafên diyariyê	radeya diyar	rewşa binavkirî
	qertafên nediyariyê	radeya nediyar	rewşa nebinavkirî
yekhejmar	yekjimar	yekjimar	tekane

Me bi alîkariya lîsteya xwe ya peyvên mînak, bala xwe da *Kesandina Lêkerên Kurmancî* (Aynur Bozkurt, 2008), *Rêzimana Kurmancî* (Mikaîl Bilbil û Bahoz Baran, 2008), *Zimanê Kurdî* (Azad Zal, 2009) û xebatên *Grûba Kurmancî* (Grûba Kurmancî, 2010) ku bi qasî ku em dizanin bi kurdî axirîn xebatên çapkirî ne.

Di vê tabloyê de jî diyar dibe ku xebatên van salên dawîn jî di warê termînolojiya zimannasiyê de di pîrriya peyvan de li hev nakin. Di nava van lêkolîn û rêzimanan de jî, me 49 mînak dan ber hev, lê belê, em dibînin ku bi tenê 15 mînak hevpar in : *avaniya lebatî, daçek, gihanek, hevok, hoker, kirde, lêker, rader, navdêr, neyînî, qertaf, rawe, rengdêr, tewang, tîpên girdek*.

Herçî xebata Bozkurt (2008) e, ew çavkaniyeke berfireh ya li ser kişandina lêkeran e ku ew bi xwe jê re dibêje « *kesandina lêkeran* ». Lê belê, di wê pirtûkê de ne diyar e ka gelo lêkolînera kurd li gora çî biryar daye bê çend demên kurdî hene. Lewre, di xebata wê de formên mîna « *Min dixwendîye* » (boriya domdar a çîrokî) û « *Min xwendibûye* » (boriya dûr a çîrokî) jî hene ku em nizanin bê Bozkurt (2008) li gora kîjan çavkaniyê ev form di nava sîstema demên kurdî de hesibandine. Bi taybetî jî mînak « *Min dixwendîye* » ku Bozkurt bi xwe dide, weke mînakeke çêkirî xuya dibe. Di eslê xwe de, mînakên mîna « *Ez dixwînime* » li herêma rojavayê bakurê Kurdistanê tînan bikaranîn, lê belê ew forma ku ji *dema niha* bi paşgira -e'yê ava bûye bi taybetmendiya lêkera *xwendinê* ve girêdayî ye û nîşan dide ku di dema ravekirina xwe de bûyera *xwendinê* hê dewam dike. Heger em vê formê, weke ku hin rêzimanên kurdî dibêjin, weke formeke *domdar* qebûl bikin, hingê divê em bikarin hemû lêkeran bixin vê formê, lê belê mînakên mîna « *Ez lê hay dibime* » an jî « *Ez dibînime* » dê nekevin serê mirov, lewre lêkera *lêhaybûyin* an jî lêkera *dîtîne* ne mîna lêkera *xwendinê* ne û pêvajoyeke dirêj ji bo pêkhatina wan ne pêwîst e. Ji ber ku lêkolînera kurd bi awayekî morfolojîk nêzîkî lêkeran bûye, lê belê taybetmendiya lêkeran yê *pêvajoyê* ku jê re dibêjin *aspect* ji bîr kirine, hingê pîrsgirêkên bi vî awayî jî derdikevin holê.¹ Di tercîhên xwe yê peyvan de jî Bozkurt (2008) heman helwêstê nîşan dide û digel ku xebatên berî wê ji bo dema lêkeran ya ku jê re dibêjin *Futur* bi pîrranî digotin *dema bê*, ew jê re dibêje *dema wêbê*. Herweha ew ji *pêşgirên deman* re jî dibêje *berlêker* (mîna *di-*, *bi-*) ku ev nav têra ravekirina erka wan nake, lewre ew pêşgir him ji bo avakirina demê û him jî ji bo avakirina pêvajoyê tînan bikaranîn. Weke nimûne lêkera bi pêşgira *di-*yê, mîna pêşgira *mi-*ya farisî, di dema dîtina xwe de hê dewam dike. Ji ber wê ye ku em ji pêşgira *di-*yê re dibêjin, *pêşgira berdewamiyê*.

Hin peyvên din jî hene ku lêkolînerên kurd di rastnivîsandina wan de ji hev cuda dibin :

¹ Me di lêkolînen xwe yê 2006'an de bi fransî û bi kurdî behsa vê mijara paşgira -e'yê kiribû û bikaranîna wê ya di hin lêkeran de nixandibû.

BOZKURT (2008)	BILBIL-BARAN (2008)	ZAL (2009)	KURMANCÎ (2010)
cînavk	cînavk	cînav	pronav (cihnav)
erênî	erênî	erênî	erînî
	tîpên hûrek	tîpên hûrdek	tîpên hûrek
yekhejmar	yekjimar	yekjimar	
lêkerên hevedudanî	lêkerên hevedanî	lêkerên hevedudanî	lêkerên hevedudanî

Em dibînin ku di vira de jî pirsgirêka di navbera *cînav* û *cînavk* diyar dibe. Herçî tercîha *Grûba Kurmancî* ya *pronavê* ye, weha xuyaye ku ji ber bandora xebatên Kamûran Bedirxan tê ku peyva *pronav* ji peyva *pronom* anîbû. Lê belê, di nivîseke hejmar 24'an de ku ji aliyê Michael Chyet ve hatiye nivîsandin, digel ku peyva *cihnav* hatiye bikaranîn jî, amadekarên çapa 40 hejmarên *Kurmanciyê* guh nedaye vê tercîhê û ev peyv nexistiye nava ferhenga xwe.

Di tabloya danberheva rêziman û xebatên dawîn de, em dibînin ku carinan termînolojiyeke gellekî cuda jî weke *pêger*, *pêşgîn*, *paşgîn* hatiye bikaranîn ku ev yek dikare rêyê bi temamî li ber têgihîştina berhemê jî bigire. Ji ber wê ye ku berhema Azad Zal (2009), heger ne bi alîkariya ferhengokê be, ji aliyê termînolojiyê ve, nikare were fahmkirin.

Heger em bixwazin hin cudahiyên mezin yên di nava van xebatên dawîn de destnîşan bikin, em dikarin nimûneyên mîna yên jêrê bidin :

BOZKURT (2008)	BILBIL-BARAN (2008)	ZAL (2009)	KURMANCÎ (2010)
bireser	bireser	pêger	tişte
	payeya rengdêran	kemperandin	kemperandin
gerguhêz	gerguhêz	gerguhêz	têper
pêşgir	pêrkît	pêşgîn	pêşdanî
paşgir	parkît	paşgîn	paşdanî
	qertafên diyariyê	radeya binav	rewşa binavkirî
pirhejmar		pirjimar	pirane
raweya danzanî			raweya pêşker

Tabloya hin nimûneyên cudahiya xebatên van salên dawîn dikare bi tena serê xwe destnîşan bike bê pirsgirêka termînolojiyê çendî ciddî ye. Lewre heger mirov ji bo peyva *object* ya inglîzî çar pêşniyarên cuda li xwendekarên zimanekî bike (*serve*, *bireser*, *pêger*, *tişte*), mirov ji dêleva hezkirina wî zimanî, ancax dikare tirsî ji wî zimanî bide kesên ku dixwazin rêzimana wî bixwînin. Lê, weha diyar e ku êdî peyva *bireser* zêdetir tê bikaranîn.

Herweha ji bo peyva *comparaison* (muqayese), teva tabloya yekem diyar dibe ku zimannasên kurd şeş tercîhên cuda pêşniyar dikin: *berhevda*, *berhevanî*, *berhevdanî*, *hevrukirin*, *payeya rengdêran*, *kemperandin*. Peyva *berhevdanê* bi wateya xwe bi kurdî mîna

civandin an jî *komkirinê* ye ku dûrî wateya *muqayeseyê* ye. Ji ber wê ye ku em di vê nivîsê de *danberhevê* tercîh dikin, lewre bi kurdî, ji bo muqayesekirinê, *mirov tiştan dide ber hev*.

Ji bo peyva *superlatîfê* jî, dîsa şeş tercîhên cuda hatine pêşniyarkirin : *berhemîn, serekanî, payeya bilind, berztirîn, pîleya herî raseriyê, lapekemper*. Peyvên *kemper û lapekemper* ji aliyê Celadet Bedirxan ve rasterast ji inglîzî û fransî hatine girtin.

Me heman mînak bi kurmanciya behdînî re dan ber hev û me dît ku ji van peyvan, herçend awayên bilêvkirinê cuda bin jî, 11 peyv hevpar in² ku ew jî ev in : *dijwate, cîhnav, cîhnav kesane, dema borî, dema niha, hejmar, pêşgir, paşgir, raweya fermanî, tîpên gir, tîpên hûr*.

Di danberheva termînolojiya kurmanciya bakurî û ya behdînî de, hin cudahiyan xurt jî berbiçav dibin. Tabloya jêrê 25 peyvên ku di rêzimanan de herî zêde tînan bikaranîn nîşan dide.

KURMANCIYA BAKURÎ	KURMANCIYA BEHDÎNÎ
bireser, pêger, tişte, serve	berkar
daçek	nîşan, bernav
dem	tens
dema bê	tofê dihêt
dengdar, bédeng	consonant
dengdêr, bideng	vowel
derb, kirp	awaz, hêz
gîhanek	amrazê lêkdanê
hevok	riste
hevoksazî	ristesazî
hoker	hevalkar
kirde	biker
lêker	kar, kirin
kişandin, kesandin	gerdankirin
gerguhêz	têper
negerguhêz	netêper
hevedudanî	darêjtî
rader	jêder
neyînî	nerê
qertaf	nîşan
rawe	rêje
raweya bilanî, raweya hestbarî	rêjeya merci
ra, reh, kok	binyad
rengdêr	hevalnav
tewang	tiyan

² Ji bo alikariya vê danberheva termînolojiya di navbera kurmanciya bakurî û ya behdînî de, em spasdarê Dr. Bayiz Omer Ehmed in. Cf. *Tens li diyalekta jorî ya zimanê kurdî li govera Badînî*, Dihok, 2002.

1.1. Dengdêr an dengdar ?

Piştî danberheveke giştî, em dikarin niha jî bala xwe bidin mînakekê bi tenê, da ku em fahm bikin bê pirsgirêka termînolojiyê dikare heta çî radeyê kûr biçe.

Di dema lêgerîna me ya peyvên xebat û lêkolînên li ser kurdî de, em lê hay bûn ku li ser peyveke ku di rêzimanan de gellekî tê bikaranîn, tevliheviyeke ewqasî ecêb peyda bûye ku mirov lê şaş dibe. Ev tevlihevî di bikaranîn û binavkirina cureyên tîpên alfabeya kurdî de pêk hatiye. Celadet Bedirxan di *Rêzana Elfabêya Kurdî* de weha dibêje :

« *Elfabêya kurdî ji sih û yek herfan hevedudanî ye (...) Herf di dengdayiyê de du texlît in : dengdêr û dengdar. (...) Di zimanê kurdî de heşt dengdêr hene : a, e, i, ê, î, u, o, û. (...) Di zimanê kurdî de bîst û sê dengdar hene. »³*

Em di *Rêzana Zimanê Kurdî* ya Kamûran Bedirxan de jî heman hevokan dibînin⁴. Kamûran Bedirxan heman peyv bi heman wateyan di ferhengoka paş berhema xwe de jî bi kar anîne û ev ferhengok di çapên vê berhemê yên bi tirkî de jî hatiye bicîhkirin. Hingê, em dibînin ku di tercîha van herdu lêkolînerên pêşîn yên rêzimana bi zimanê kurdî de tu guhertin pêk nehatiye. Ew ji bo peyva *voyelle* û *vowel* bi kurdî dibêjin *dengdêr* ; ji bo peyva *consonne* û *consonant* jî bi kurdî dibêjin *dengdar*. Pirraniya ferheng û rêzimanên kurdî jî mîna wan heman peyv bi heman wateyan bi kar anîne. Em dibînin ku di rêzimanên kurdî yên van salên dawîn de jî ew herdu têgeh her bi helwêsta Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan ve hatine binavkirin. Lê belê, di nava zimannas û rêzimannasên kurd de, tercîheke cuda jî diyar dibe ku heger mirov ji berê de bi vê cudahiye nizanibe, mirov nikare ji vê mijara sereke ya rêzimanan jî fahm bike.

Heta niha, me didît ku zimannas û rêzimannasên kurd ji bo heman têgehyan peyvên cuda tercîh dikirin. Vê helwêsta wan bêguman karê fêrkirina rêzimana kurdî girantir dikir, lê belê tevliheviyeke wateyî peyda nedikir. Di *mijara dengdêr û dengdaran* de lêkolînerên kurd heman peyvê vê carê ji bo têgehên cuda bi kar tînin. Pirsgirêka mezintir jî ji vira û bi şûn de derdikeve. Lewre, heger di rêzimanê kurdî de peyva *dengdar* ji bo 23 tîpên *consonne/consonant* hatibe bikaranîn, êdî mirov wê peyvê ji bo wan tîpan ji ber dike. Lê belê gava ku mirov bibîne ku di rêzimanê kurdî de heman peyva *dengdar* vê carê ji bo tîpên *voyelle/vowel* tê bikaranîn, êdî mirov nikare ji nav derkeve. Nabe ku du têgehên zimannasiyê yên cuda xwedan heman navî bin. Bi taybetî jî gava ku ew herdu têgeh dijberê hev bin.

³ Mîr Hereqol Ezîzan (1932), *Rêzana Elfabêya Kurdî*, r. 3-4.

⁴ Kamran Bedir-Xan (1971), *Rêzana Zimanê Kurdî*, Parîs, r. 2.

Di *Rêziman a Zimanê Kurdî* de em dibînin ku Reşîd Kurd (1956) peyva *dengdar* ji bo tîpên *voyelle/vowel* bi kar tîne û ji bo tîpên *consonne/consonant* jî dibêje *bêdeng*. Heger ew di vê helwêstê de bi tenê bûya, pirsgirêk ewqasî mezin nedibû; lê belê, Mûrad Ciwan (1992) jî li hember navên wan têgehên yê bi tirkî, mîna Reşîd Kurd, *dengdar* û *bêdeng* nivîsîne. *Grûba Kurmancî* û *Ferhenga Tirkî-Kurdî* ya Mehmed Tanrikulu jî mîna Reşîd Kurd kiriye.

	VOYELLE / VOWEL			CONSONNE / CONSONANT	
	<i>Dengdêr</i>	<i>Dengdar</i>	<i>Bideng</i>	<i>Dengdar</i>	<i>Bêdeng</i>
Celadet Bedirxan	X			X	
Kamûran Bedirxan	X			X	
Baran Rizgar	X		X	X	X
Arif Zêrevan	X			X	
Çeto Ozel	X			X	
Samî Tan	X			X	
Sibhî Ahmed	X			X	X
Kamûran Bêkes	X			X	
Aynûr Bozkurt	X			X	
Hînger	X			X	
Evdila Dirêj	X			X	
M. Bilbil & B. Baran	X			X	
Azad Zal	X			X	
Celadet Çelîker	X			X	
<i>Zana Farqînî - F</i>	X			X	
<i>D. Îzolî - F</i>	X			X	
<i>Kamêran Botî - F</i>	X			X	
<i>Salah Sadellah - F</i>			Nedengdar	X	
<i>Mehmet Tanrikulu - F</i>		X			X
Reşîd Kurd		X			X
Mûrad Ciwan		X			X
Kurmancî		X			X
Qanatê Kurdo			Denganî		Bêdengani

Weke ku di vê tabloya me de jî aşkere dibe, me bala xwe da 23 rêziman û ferheng û lêkolîn û metodên fêrkirina kurdî. Weha xuya ye ku pîraniya lêkolîneran peyva *dengdar* ji bo tîpên *consonne/consonant* bi kar aniye.

Di xebata *Grûba Kurmancî* de, di vê mijarê de jî navkokiye ber bi çavên me ve ket. Di vê xebatê de, nivîseke li ser rêzimana kurdî heye ku ji *Rêzimana Celadet Bedirxan* û Roger Lescot (1970) ji fransî hatiye wergerandin û di hejmarê 4'an ya *Kurmanciyê* de hatiye çapkirin. Di wî beşê li ser hin pirsgirêkên fonetîka kurmanciyê de, peyvên mîna *dengdar* û *dengdêr* bi wateyên xwe yê resen hatine bikaranîn û ji bo *voyelle/vowel* gotiye *dengdêr*, ji bo

consonne/consonant jî gotiye *dengdar*. Heta vira tu pirsgirêk xuya nabe. Lê belê, di ferhenga çapkirî ya 2010'an de li hember peyva *voyelle* ya fransî, bi kurdî *dengdar* hatiye nivîsandin ; li hember peyva *consonne* a fransî jî, bi kurdî *bêdeng* nivîsandî ye. Di hejmara 9'an ya *Kurmanciyê* de Rojen Barnas sedema vê tercîhê aşkere dike û dide zanîn ku Kamûran Bedirxan peyvên *dengdêr* (ji bo *voyelle*) û *dengdar* (ji bo *consonne*) bi kar dianîn, lê belê ev peyv dişibin hevdu, û bi armanca hêsankirina fêrbûyina kurdî, *Grûba Kurmancî* peyva *dengdar* (ji bo *voyelle*) û peyva *bêdeng* (ji bo *consonne*) tercîh kiriye. Lê belê, nayê zanîn ka gelo çima *Grûba Kurmancî* peyva *dengdar* xistiye şûna peyva *dengdêr* ya ku him ji aliyê Celadet Bedirxan û him jî ji aliyê Kamûran Bedirxan ve ji bo tîpên *voyelle/vowel* hatibû bikaranîn. Mirov fahm nake bê çawa dibe ku du peyvên bi wateyên cuda û dijber dikarin di şûna hevdu de werin tercîhkirin ?

Em dibînin ku serê lêkolînerên kurd di vê mijarê de tev li hev bûye. Ji ber wê ye ku di *Uygulamali Kürtçe Dersleri* ya Baran Rizgar (1993) de herdu tercîh jî hene, lê belê diyar e ku wî xwastiye rêyê li ber tevliheviyê bigire, lewre wî peyvên *dengdêr* û *dengdar* li gora Bedirxaniyan bi kar anîne û ji bo fahmdana wan jî navekî duyem li wan kiriye, ku ji tirkî wergerandiye, da ku rêyê li ber tevliheviya têgihîştinê bigire.

Herweha diyar e ku Salah Sadallah jî di amadekirina *Ferhenga îngilîzî kurdî* de bi heman pirsgirêkê mijûl bûye û qey ji ber wê ye ku digel ku mîna Celadet Bedirxan ji tîpên *consonne/consonant* re dibêje *dengdar*, ji tîpên *voyelle/vowel* re dibêje *nedengdar*, û xwe bi vî awayî ji wê tevliheviya *dengdêr* û *dengdaran* safî dike.

Bi tenê li cem Qanatê Kurdo peyvîne gellekî cuda hatine bikaranîn. Di dawiya *Gramera Zmanê Kurdî* ya Qanatê Kurdo de çavkaniyên wî jî hene û em dibînin ku Qanatê Kurdo di nava berhemên berî xwe yên bi kurmancî de, bi tenê bala xwe daye nivîsên Celadet Bedirxan yên di kovara *Hawarê* de. Lê, mirov nizane bê Qanatê Kurdo çima qîma xwe bi termînolojiya Celadet Bedirxan neaniye ku Celadet Bedirxan xwediyê yekem rêzimana kurdî ya bi kurdî ye.

1.2. Pirsgirêka şayes û termînolojiya deman di rêzimanên kurdî de

Heger mirov bixwaze sîstema deman fêrî xwendekaran bike, mirov mecbûr e ku navekî li *raweyan* bike ku bi îngilîzî ji wan re dibêjin *mood* û bi fransî jê re dibêjin *mode* û her rawe bi serê xwe xwedan navekî taybetî ye. Bi îngilîzî û fransî ji wan re dibêjin *indicatif*, *subjonctif*, *conditionnel* û *imperatif* û ji bo forma lêkeran ya *dema bihurî* ku weke *rendgêr* tê bikaranîn jî dibêjin *participe passé* ku ev hemû nav jî ji lafînê hatine.

Di zimannasiyê de, bi taybetî di warê demên lêkeran de, raweya *indicatif* weke raweya sereke diyar dibe, lê zimannasên kurd ji bo wê jî sê navên cuda pêşniyar kirine.

Em ê niha, weke nimûne, bala xwe bidin çar xebatên ku ji bo vê mijara raweyan peyv avakirine : K. Bedirxan (1971), Tan (2005), Bozkurt (2008) û Kurmancî (2010).

BEDIRXAN (1971)	TAN (2005)	BOZKURT (2008)	KURMANCÎ (2010)	Fransî
Raweya pêşker	raweya pêşkerî	raweya danzanînî	raweya pêşker	<i>Indicatif</i>
Raweya bilanî	raweya bilanî/xwestekî	raweya hestbarî	raweya bilanî	<i>Subjonctif</i>
Raweya hekînî	raweya mercî/hekanî	raweya mercî	raweya hekînî	<i>Conditionnel</i>
Raweya fermanî	raweya fermanî	raweya fermanî	raweya fermanî	<i>Impératif</i>
Raweya çêbiwar	raweya çêbiwar		parenga raborî	<i>participe passé</i>

Hêjayî gotinê ye ku xebatên Kamûran Bedirxan û ya Samî Tan û ya *Grûba Kurmanciyê* yên di vî warî de berî ya Aynur Bozkurt bi gellek salan hatine çapkirin û her sêyan jî ji bo *indicatifê* heman peyv bi kar aniye, lê belê Bozkurt (2008) peyveke nû pêşniyar dike. Weha diyar e ku Bozkurt navên raweyan rasterast yan ji fransî yan ji tirkî wergerandine. Lewre, weke mînak, *raweya danzanînî* bi tirkî dibe *haber kipi* û bi fransî jî dibe *indicatif* ku yekser wergera tercîha Bozkurt (2008) e. Ev jî careke din aşkere dike ku Bozkurt di warê termînolojiyê de guh nedaye xebatên kurdî yên berî xwe ku, ji bo lêkolîneke bi îddiayeke ewqasî ciddî, ev rewş dibe sedema mixabiniyeke mezin, lewre xebata Bozkurt, bi qasî ku em dizanin, yekem xebata kişandina lêkeran e ku hatiye çapkirin.⁵

Di vê tabloyê de aşkere dibe ku *Grûba Kurmancî* ya ku li termînolojiya Kamûran Bedirxan niheriye, di hin waran de bi avakirina wî ya peyvan qane nebûye. Weke ku diyar dibe, di pênc nimûneyên hilbijartî yên tabloya jorê de, du nimûne ji aliyê *Grûba Kurmancî* ve ji nû ve hatine nirxandin û *raweya çêbiwar* bi awayekî weha bûye *parenga raborî* ku me şopa peyva *pareng* di xebatên berê de peyda nekir. Lewre, *Grûba Kurmancî* ji bo peyva *mood-mode*, peyva *rawe* bi kar anîbû ; lê belê, dibe ku ew *participe passé* ya fransî weke rawe nahesibîne û ji ber wê be ku ji bo vê têgehê peyveke cuda hatibe bikaranîn.

Pirsgirêka rêzimanên kurdî ya di warê rawe û deman de ne bi tenê di termînolojiyê de ye. Weke ku me di lêkolîneke xwe ya berê de bal kişandibû ser⁶, hejmara demên lêkeran di

⁵ Di pirtûkxaneyaya Enstîtuya Kurdî ya Parisê de me xebateke din di vî warî de dît ku sala 1991'ê ji aliyê Mamed Jemo ve hatiye amadekirin, lê belê nehatiye çapkirin.

⁶ Aydogan (2006), *Temps, subordination et concordance des temps en kurde*, Teza doktorayê, Zanîngeha Rouenê. Beşê vê xebatê ye li ser deman bi dû re di kovara *Zend*'ê de jî di hejmara *payiz-2006*'an de bi kurdî hatibû çapkirin.

rêzîmanên kurmanciyê û xebatên vî warî de ne yek e. Heke ji bo demên kurmanciyê yên lêkeran em bala xwe bidin hin rêzîman û xebatan, em ê encamên jêrê bi dest bixin.

Celadet Bedirxan û Roger Lescot (1970)	: 17 demên lêkeran
Reşîd Kurd (1956)	: 14 demên lêkeran ⁷
Kemal Badilli (1965)	: 15 demên lêkeran
Qanatê Kurdo (1990)	: 10 demên lêkeran
Feqî Hisên Sagniç (1991)	: 16 demên lêkeran ⁸
Mamed Jemo (1991)	: 29 demên lêkeran
Mûrad Ciwan (1992)	: 18 demên lêkeran
Rojen Barnas (1993)	: 17 demên lêkeran
Baran Rizgar (1993)	: 12 demên lêkeran ⁹
Joyce Blau û Veysi Barak (1999)	: 16 demên lêkeran ¹⁰
Evîn Yalçin (2000)	: 21 demên lêkeran
Subhî Ahmad (2003)	: 12 demên lêkeran ¹¹
Kamiran Bêkes (2004)	: 17 demên lêkeran
Samî Tan (2005)	: 27 demên lêkeran ¹²
Aynûr Bozkurt (2008)	: 16 demên lêkeran
Mikaîl Bilbil û Bahoz Baran (2008)	: 13 demên lêkeran
Azad Zal (2009)	: 14 demên lêkeran

Ji bo naskirina formên lêkeran ku di van lêkolîn û rêzîmanên jorê de weke *demên lêkeran* hatine pejirandin, pêwîst e ku mirov bi tabloyekê wan bide ber hev. Em ê du lêkolînên bi fransî hatine kirin û du lêkolînên dawîn ku bi kurdî hatine kirin weke nimûne bidin ber hev. Ji xwe Yalçin (2000) rêzîmanên Badilli (1965)¹³, Bedirxan û Lescot (1970), Ciwan (1992), Sagniç (1991) û Rizgar (1993) û Blau û Barak (1999) dabûn ber hev û lîsteya xwe ji wan amade kiribû. Bi vî awayî, ev tabloya jorê dikare bi awayekî baş temsîla hemû rêzîmanên kurdî bike.

⁷ Reşîd Kurd berhema xwe ya bi navê *Rêzman a Zimanê kurdî* sala 1956'an çap kiriye, lê belê em di vê lêkolînê de xwe dispêrin çapa wê ya 2006'an ya Şamê ku ji aliyê çapxaneyê Dar-el Zaman ve hatiye kirin.

⁸ Li gora Yalçin, Feqî Husên Sagniç behsa 15 demên lekeran dike. Lê belê, Sagniç navê 16 deman dide. Ya ku Yalçin nahesibîne ew dem e ku Sagniç dibêje ku bi tenê ji bo lêkerên alîkar yên mîna *karîn, zanîn, vîn û wêrîn* tê bikaranîn. Me di xebata xwe ya 2006'an de ev lêker weke *lêkerên marjînal* bi nav kiribûn.

⁹ Berhema Baran Rizgar ya bi navê *Uygulamali Kürtçe Dersleri* (bi tirkî ye) sala 1993'an hatiye çapkirin. Lê, em di vê lêkolînê de xwe dispêrin çapa wê ya sala 2005'an.

¹⁰ Digel ku Blau û Barak (1999) şayesa 16 demên lêkeran dikin jî, ew, di tabloya xwe ya deman ya encamê de (r. 117), bi tenê navê navê 13 deman didin.

¹¹ Li ser berhema Subhî Ahmad ya bi navê *Pirtûka Rêzîman : Zaravayê kurmançî*, mixabin sala çapê nehatiye nivîsandin. Lê belê ji hejmara wê ya ISBN'yê diyar dibe ku sala 2003'an hatiye çapkirin.

¹² Ya rastîn, Samî Tan behsa 19 demên lêkeran dike. Lê belê, ew hin formên lêkeran bi gellek navên cuda ji nû ve şîrove dike. Li gora van şîroveyan, em fahm dikin ku ew behsa 27 demên lêkeran dike. Em di tabloya danberhevê de bi tenê behsa wan 19 forman dikin. Di xebata Mikaîl Bilbil û Bahoz Baran de jî formeke lêkeran bi gellek awayan hatiye bikaranîn ku heman pîrgirêka *Rêzîmana* Samî Tan, di *Rêzîmana* wan de jî diyar dibe.

¹³ Li gora lêkolîna Yalçin (2000), Kemal Badilli behsa 11 deman dike, lê di eslê xwe de Badilli li ser 15 formên lêkeran disekine. Me jî li gora wê di xebata xwe ya 2006'an de gotibû ku behsa 11 deman dibe, lê bi dû re em lê hay bûn ku Yalçin (2000) demên Badilli (1965) kêma hesabandine.

Navên formên lêkeran li gorî Jemo (1991), Yalçin (2000)¹⁴, Tan (2005) û Bilbil – Baran (2008).

Mînak	JEMO (1991)	YALÇIN (2000)	TAN (2005)	BILBIL-BARAN (2008)
Ez dikevim	dema niha	dema niha	dema niha	dema niha
Ez dikevime	dema niha ya domdar	dema niha ya domdar	dema niha ya domdar	
Ez hergav dikevim		dema fireh	dema fireh	
Ez ê dikevim			dema niha ya berbiçav	
Ez ketim	dema boriya têdeyî	dema boriya têdeyî	dema boriya têdeyî	dema boriya têdeyî
Ez nuh ketim	dema bihuriya nêzîk			
Ez ketime	dema boriya dûdar	dema boriya dûdar	dema boriya dûdar	dema boriya dûdar
Ez diketim	çirokiya dema nuha	raboriya berdest	dema boriya berdest	çirokiya dema niha
Ez diketime	çirokiya d. nuhaya domdar	raboriya berdest a çirokî		
Ez diketibûm	çirokiya d. nuha a dûr	raboriya dûr a liserbûyinê		
Ez diketibûme	r. berdest a dûr û domdar			
Ez ketibûm	çirokiya boriya têdeyî	çirokiya boriya têdeyî	çirokiya boriya têdeyî	çirokiya dema boriya dûdar
Ez ketibûme	ç. boriya têdeyî a domdar	ç. b. têdeyî a nedîtîne	çirokiya boriya dûdar	
Ez dikim bikevim	dema bê ya nêzîk	dema bê ya nêzîk	dema bê ya nêzîk	
Ez dikim bikevime	dema bê ya nêzîk û domdar			
Ez ê bikevim	dema bê	dema bê	dema bê	dema bê
Ez ê bikevime	dema bêya domdar			
Ez bikevim	dema nihaya xwestekî	dema nihaya xwestekî	dema nihaya xwestekî	xwestekî/bilani/şertî/viyani 1
Ez bikevime	d. nihaya xwestekî û domdar			
Ez ketibim	dema bihuriya xwestekî	dema bihuriya xwestekî	raweya merc û daxwazê	
Ez ketibime	d.b. xwestekî û domdar			
Ez biketama	çirokiya d. nuha a xwestekî	dema boriya mercî	dema boriya xwestekî	çirokiya raweyên xwestekî
Ez biketabûma	r.b. a dûr a xwestekî			
Ez ketibûma	çirokiya xwestekî	dema boriya dûr mercî	çirokiya xwestekî	xwestekî/bilani/şertî/viyani2
Ez ê ketibim	dema bihuriya mercî	dema bihuriya xwestekî(2)	dahatiya pêş	dema bê ya têtûz
Ez ê ketibime	dema bihuriya mercî a domdar			
Ez dikira biketama		d. bihur. mercî a dahatiya pêş	dema bêya nêzîk a xwestekî	
Ez ê biketama	çirokiya dema nuhaya mercî	dema boriya mercî (2)	dema bêya xwestekî	çirokiya dema bê
Ez ê biketabûma	çirok. D. nuhaya mercî û dûr			
Ez ê ketibûma	çirok. boriya têdeyî a mercî	dema boriya dûr a mercî (2)	dema bêya çirokiya xwestekî	
Bikeve	nihaya raweya fermanî	raweya fermanî	raweya fermanî	raweya fermanî
Bikeveye	n. raweya fermanî a domdar			

¹⁴ Em bi xwe navên demên Jemo (1991) û yên Yalçin (2000) wêrdigerînin kurmançî, ji ber ku ev lêkolîn fransî hatine kirin. Di vê wergerê de û di wergerên din de ku di vê xebatê de ji fransî hatine kirin, me hewl da ku, heta ku ji me were, em sadiqî tercîha lêkolîneran bimînin.

Li gora tabloya me ya danberhevê diyar dibe ku di kurmanciyê de em dikarin behsa 32 *formên lêkeran* bikin ku zimannasên kurd weke *demên lêkeran* dipejirînin. Em dibêjin 32 form, lewre hin form di hin xebatan de xuya nabin, lê di xebatine din de hene. Gava ku mirov hemû forman dide ser hev, hingê ev hejmar bi dest dikeve ku di tu zimanan de ewqas dem nînin.

Me pirsgirêka zêdebûna formên lêkeran an jî demên wan di xebatên xwe yên berê de nirxandibû û hin encam pêşniyar kiribûn. Lê belê tabloya jorê pirsgirêka binavkirina wan forman jî destnîşan dike ku ev pirsgirêk dikeve warê termînolojiyê.

Em di tabloya jorê de bi awayekî zelal dibînin ku di warê deman de jî lihevkiyaneke giştî ya termînolojiyê xuya nabe. Di nava herdu xebatên fransî de, û herweha di nava herdu xebatên kurdî de, em dibînin ku cudahiyan bingehîn yên binavkirinê hene. Ev cudahî di nava xebatên din de jî diyar dibe.

Bi vî awayî, hersê xebatên din ku bi fransî li ser zimanê kurdî hatine kirin, Bedirxan û Lescot (1970), Jemo (1991) û Blau-Barak (1999) jî di binavkirina deman de li hev nakin. Weke nimûne, Blau-Barak (1999) ji forma « *Ez ê ketibim* » re dibêjin *subjonctif parfait* (dema boriya xwestekî ya nêzîk) digel ku Jemo (1991) jê re gotibû *prétérit conditionnel* (dema boriya mercî) û Bedirxan-Lescot (1970) jî jê re gotibû *futur antérieur* (dema boriya dema bê). Herweha Blau-Barak (1999) ji forma « *Ez ê biketama* » re dibêjin *conditionnel parfait* (merca nêzîk) digel ku Bedirxan-Lescot (1970) û Jemo (1991) jê re gotibûn *imparfait du subjonctif* (çîrokiya dema niha ya xwestekî).

	Blau-Barak (1999)	Jemo (1991)	Bedirxan-Lescot (1970)
<i>Ez ê ketibim</i>	Subjonctif parfait	Prétérit conditionnel	Futur antérieur
<i>Ez ê biketama</i>	Conditionnel parfait	Imparfait du subjonctif	Imparfait du subjonctif

Termînolojiya Bedirxan-Lescot bi me bêtir nêzîkî rastiya erka deman xuya dibe. Binavkirinên nêzîkî ya Bedirxan-Lescot di rêzimana Feqî Hisên Sagniç de jî xuya dibe. Sagniç jî ji « *Ez ê ketibim* » re dibêje « dema bêya hevedudanî » û ji « *Ez ê biketama* » re jî dibêje « çîrokiya xwestiniya hevedudanî » ku bi wateya xwe ve nêzîkî binavkirina Bedirxan-Lescot e. Gellekî balkêş e ku tu peywendiya « xwestiniyê » di vê mînakê de xuya nabe, lewre

ew bêtir *dema bê ya dema bihurî* (futur du passé) rave dike. Herweha, Blau û Barak (1999) lê hay nebûne ku ji xwe hevokên kurmanciyê yê mercî bi *raweya xwestekî* tên pêkanîn. Qey ji ber wê ye ku wan ev herdu nav tev li hev kirine.

Yalçin (2000) û (2001)¹⁵ termînolojiya Joyce Blau¹⁶ tercîh dike. Lê belê Yalçin (2000) carinan weke Joyce Blau bi nav nake û ji « *Ew diketiyê* » re dibêje *imparfait narratif* (çîrokiya niha ya vegotinê) digel ku Bedirxan-Lescot (1970) û Blau-Barak (1999) jê re gotibû *imparfait duratif* (çîrokiya niha ya domdar).¹⁷

Herçî rêzimanên bi zimanê kurdî ne, lihevkirina wan ji xebatên bi fransî ne çêtir e. Digel ku Sagniç (1991) forma *dema bêya hevedudanî* (*Ez ê ketibim*) xistibû nava rêzimana xwe, ev form di rêzimanên Rizgar (1993) û Tan (2005) de xuya nabe. Lê belê heman form di rêzimana Ciwan (1992) de bi navê *gelecek zamanin rivayeti* diyar dibe ku ev rêziman jî mîna ya Rizgar bi zimanê tirkî hatibû nivîsandin.

Herweha, Sagniç (1991) ji forma « *Ew biketaya* » re dibêje *çîrokiya xwestinî* lê belê Rizgar (2005) jê re dibêje *Bilanî : dema boriya têdayî* û Tan (2005) jî bi sê awayên cuda behsa vê formê dike¹⁸ û jê re dibêje *dema boriya raweya xwestekî*, *dema boriya raweya bilanî* û *dema boriya berdest ya raweya divêtî*. Hingê Tan di bin sê mijarên cuda de heman formê bi kar tîne, lewre ew vê formê bi *bilanî*, *divêtî* û *xwestekî* dinirxîne. Lê belê, « *bila* » bi kurdî ji bo ravekirina daxwazan tê bikaranîn ku bi vî awayî *raweya bilanî* û *raweya xwestekî* ku di rêzimana Tan (2005) de hene dikevin heman warî ; « *divê* » jî ji bo ravekirina *mecbûriyetan* tê bikaranîn ku ravekirina van hemû rewşan bi heman forma lêkeran tê pêkanîn, lewre ew *hestan*, *tirsan*, *daxwazan* û *mecbûriyetan* rave dikin ku bi inglîzî û fransî ji wan re dibêjin *subjonctif*. Ji xwe navê vê raweyê jî ji tirkî hatiye wergerandin, lewre bi tirkî jê re dibêjin *dilek ve istek kipleri*.

	SAGNIC (1991)	RIZGAR (2005)	TAN (2005)
<i>Ez ê ketibim</i>	Dema bêya hevedudanî		
<i>Ez biketama</i>	Çîrokiya xwestinî	Bilanî : dema boriya têdayî	Dema boriya raweya xwestekî

¹⁵ Yalçin (2001), *La morpho-syntaxe du verbe kurde*, teza masterê, Zanîngeha Paris III.

¹⁶ Hêjayî gotinê ye ku lêkolîna Yalçin (2000) di bin berpîrsiyariya Joyce Blau de hatiye çêkirin.

¹⁷ Ji herdu xebatên Yalçin (2000) û (2001) pê ve me tu xebatên din bi fransî nedîtin ku di qadeke akademîk de li ser demên kurmanciyê hatibin çêkirin.

¹⁸ Tan (2005), r. 254, 259 û 264.

Heman rewş di xebatên lêkolînerên kurd yê almanîxêv de jî berbiçav dibe. Huseyin Kartal (1992) di xebata xwe ya bi navê *Das Kurdische Verbum* de, ji bo binavkirina deman, hejmaran bi kar tîne û, weke mînak, dibêje *Futur I, Futur II, Passe I, Passe II*. Weha diyar e ku Kartal (1992) bi bandora xebatên zimannasiyê yê almanî ve ev tercîh kiriye, lewre di xebata Harald Weinrich¹⁹ ya li ser demên almanî de jî heman binavkirin hatine bikaranîn.

Em şopa vê termînolojiya zimannasiya almanî di lêkolîna Zerdeşt Haco (2002)²⁰ de jî dibînin. Haco di wê xebata xwe de sedema vê tercîha xwe jî aşkere dike û dibêje ku, li gora wî, ne rast e ku mirov ji dêleva peyvên latînî yê mîna *Präsens, Präteritum, Perfect, Plusquamperfect*, rabe û navine din peyda bike. Pêşniyara wî jî ew e ku mirov hejmaran bixe nava karên zimannasiya hemdem. Li gora xwe, aşkere dike ka gelo ew tiştê ku ew jê re dibêje *zimannasiya hemdem* çi ye jî û berî ku ji sê formên lêkerên kurdî re bibêje *Dema bê I* (Futur I), *Dema bê II* (Futur II), *Dema borî I* (Passe I) û *Dema Borî II* (Passe II), weha dibêje :

« Li gorî dîtina min wê baş be, gava em hijmaran, ango 1, 2, 3, 4 bixine nav rêzimaniya zimanê xwe, çawa ko îro lingûstîka hemdemî hijmaran bikar tîne. Heta di zimanê elmanî de jî Futur I û Futur II tê gotin. Ji ber vê yekê ez piştgîriya pêşniyara birêz Hisên Kartal dikim, yê ko weke ko ez dizanim, Kurdê pêşî bû, yê hijmar ji pêpelûkên demî re bi kar anîn. »

Divê mirov piçekî li ser vê daxuyaniya Haco (2002) raweste, lewre ev helwêsta ku di vê daxuyaniyê re aşkere dibe, di eslê xwe de, helwêsta hemû lêkolînerên kurd yê warê zimannasiyê ye. Weke ku di nimûneyên jorê de jî diyar dibû, zimannas û rêzimannasên kurd tim di bin bandora hin zimanên biyanî de dimînin ku baş nas dikin û xwendinên xwe yê teorîk jî bi wan zimanan dikin. Herkes dibêje qey ya herî baş referansa wî bi xwe ye û ji ber wê ye ku Haco dibêje qey zimannasiya almanî êdî *zimannasiya hemdem* e û pêşniyar dike ku herkes bide pey zimannasên alman, lê belê argumentên wî ne zelal in. Herweha, gellekî balkêş e ku Zerdeşt Haco piştî xwe naspêre zimanê erebî ku ew baş pê dizane, lê xwe dispêre

¹⁹ Harald Weinrich zimannasekî navdar yê warê deman e û pirtûka wî ya bi navê *Le Temps* weke referanseke bingehîn ya *demnasiyê* (temporality) tê pejirandin. Ew bi eslê xwe alman e, lê pirtûkên wî bi fransî jî hatine çapkirin.

²⁰ HACO Zerdeşt (2002), *Dem di kurmançiya bakur de*, weke gotareke înternetî hatiye belavkirin : <http://www.avestakurd.net/arshiv/avesta30/zerdest%20haco.htm> Ev gotar herweha bi çar beşan di kovara *Hîwa* de jî hatiye çapkirin. Zerdeşt Haco di hevpeyvîneke taybetî de bi me da zanîn ku ew lêkolîn ji teza wî ya doktorayê hatiye girtin û berfirehkirin. Haco ew teza xwe sala 1982'an li Zanîngeha Azad ya Berlînê parastibû.

zimanê almanî yê ku weke « *lingûistîka hemdemî* » bi nav dike. Ev helwêsta li ser zimanê ewropî û redda zimanê erebî dikare bi motîfasyonên siyasî ve were nirxandin.

Ev helwêsta siyasî li cem lêkolînerên kurd-bakurî bi heman rengî xuya nabe. Lewre, em dibînin ku di rêzimanên kurdî yên ku bi tirkî hatine nivîsandin de zimanê referans dîsa zimanê tirkî ye. Ji ber wê ye ku li cem Badilli (1965) û Ciwan (1992) demeke bi navê *dema fireh* diyar dibe ku berê di tu xebatên din de xuya nebûbû. Hêjayî gotinê ye ku ev dem di zimanê tirkî de heye ku jê re dibêjin *geniş zaman* û yekser wergera *dema fireh* e. Lê belê, ji bo kurdî digel ku mirov bikare behsa « *karên ku her dem tên kirin* » bike jî (mînak : *Ez hefteyê carekê diçim sînemayê*), mirov nikare ji bo vê *bikaranîna raweyî ya dema niha* behsa formeke lêkeran ya xweser bike. Lewre *hoker (hefteyê carekê)* alîkariya deman dikin, lê deman ava nakin. Gava ku formeke nuh nebe, demeke nuh jî peyda nabe. Di zimanên mîna kurdî yên ku bi heman formê gellek erkan pêk tînin de, ji van bikaranînan re dibêjin *bikaranînen raweyî*, yanî ew forma lêkerê, bi heman formê, ji bo erk û weteyeke din jî tê bikaranîn.

Zanîna zimanên ewropî weke nîşaneke xurt di nava xebatan de aşkere dibe û dikare hin encamên balkêş jî bide. Weke nimûne di lêkolîna Akrey (1982) û Blau-Barak (1999) de, em formeke « *Ez dixwînime* » dibînin ku herdu jî jê re dibêjin *present progressif*. Bi îhtimaleke mezin, ev form bi bandora xwendina rêzimana inglîzî ve ketiye rêzimana kurdî jî. Heman nirxandin dikare ji bo « *Ez dikim bikevim* » jî were kirin ku Ciwan (1992) û Tan (2005) jê re gotiye *dema bê ya nêzik*. Ev binavkirin jî di rêzimana fransî de heye, lê belê gellekî balkêş e ku herdu zimannasên kurd ku behsa wan dibe, bi qasî ku em pê dizanin, bi fransî nizanin. Weke ku me di xebatên xwe yên 2006'an de destnîşan kiribû, nimûneya *Ez dikim bikevim* ne bi demê re lê belê bi *pêvajoyê* re têkildar e ku bi inglîzî û fransî jê re dibêjin *aspect*. Herçî *dema bê* ye, ji bo ku mirov bikare behsa wê bike, fikireke diyar û armançeke zelal an jî amadekirineke pêkhatina bûyerê ya berbiçav pêwîst e û divê bûyer bi dû re pêk were. Lê, di vê nimûneyê de tu niyet û armanc an jî amadekirine kirineke bi vî rengî xuya nabe. Bi tenê *îhtimal* heye ku *ketin* pêk were, lê belê *dema bê* li ser îhtimalan nayê avakirin. Ji ber ku cudahiya di navbera *dema bê* û amadekariya *bûyera muhtemel* de gellekî hessas e, ev tevlihevî jî pêk hatiye. Çareya wê ew e ku mirov wê formê veguhezîne ser hemtaya wê ya *cîhana bihurî*²¹ û lê binere ka gelo *fikira dema bê* di vê formê de zelal e an na. Ji ber wê ye ku gava ku em wê vediguhezînin ser *cîhana bihurî* û dikin *Ez dikira biketama*, tê fahmkirin ku

²¹ Em têgehên *cîhana niha* û *cîhana bihurî* li gora modela Co Vet bi kar tînin. Vet (1981) dem li gora pêkhatina wan a di nava du *cîhanên cuda* de dihesibandin û ji wan re digot *Mondes Possibles* (cîhanên muhtemel). Li gora vê modelê, her demeke lêkeran ya cîhanekê, di cîhana din de xwedan hemtayeke ye. Weke mînak *dema niha* ya *cîhana niha*, di *cîhana bihurî* de beranberî *çirokiya dema niha* tê.

ketin pêk nehatiye. Bi tenê, *hindik mabû pêk bihataya*. Hingê *fikra dema bê* di nimûneya « *Ez dikim bikevim* » de nîne, bi tenê *ihtimal heye ku Ez bikevim*, lê belê dibe ku *Ez nekevîm* jî.

Hingê, em dikarin çavdêriyeke sereke bikin : *lêkolînerên kurd ji dêlewa ku pişta xwe bispêrin lihevkirineke giştî, xwe bi xwe hewl didin ku pirsgirêka termînolojiyê bi referansên zimanên biyanî çareser bikin*. Lê, pirsgirêk ew e ku referansa hemûyan ne yek e.

Careke din diyar dibe ku lêkolîner xebatên berî xwe baş nanirxînin. Ji ber wê ye ku em dibînin ku hayê Blau-Barak (1999) û herweha hayê Yalçın (2000) û (2001) jê nîne ku Celadet Bedirxan û herweha Kamûran Bedirxan di lêkolînên xwe de pêşniyar dikin ku *koka dema niha ji raweya fermanê were girtin*. Digel ku van herdu kesan xebatên xwe bi fransî nivîsandine, Blau û Barak (1999) û herweha Yalçın (2000) didin fahmkirin ku *ji bo bidestxistina koka dema niha tu zagon nînin*. Digel ku em dibînin ku *mekanîzmayeke bidestxistina vê kokê* hatiye pêşniyarkirin jî, mirov dibêje qey hayê lêkolînerên fransî ji hev çênebûye, lewre qet behsa pêşniyara Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan nakin jî.

Heman gazind dikare ji lêkolînên kurdî jî were kirin. Lewre di xebatên Bilbil-Baran (2008) û Zal (2009) û herweha Bozkurt (2008) de jî diyar dibe ku hayê wan ji xebata me ya 2006'an û ji wergera beşê wê yê li ser deman ku di kovara *Zend'ê* de hatibû belavkirin çênebûye. Hingê çavdêriya me ya duyem tê peyitandin: *lêkolînerên kurd xebatên berî xwe baş naxwînin an jî guh nadin wan*.

Yek ji nimûneyên herî balkêş jî ew e ku xebatên zimannasiyê bi nasnameyên siyasî tên kirin û ev jî rêyê li ber digire ku pêşketineke giştî pêk were. Lewre heger hayê lêkolîneran ji hevdu çênebe, ew ê xebatên hevdu û herweha kêmaniyên hevdu dubare bikin û nikaribin ji lêkolînên hevdu îstifade bikin. Weke nimûne, em dizanin ku di *Grûba Kurmancî* de ji 25 salan û vir ve ye ku xebateke termînolojiyê tê kirin, lê belê ji ber meyla siyasîkirina xebatên zimanî, ev xebat ji aliyê hemû lêkolîneran ve nayên naskirin. Herweha lêkolînerên ku ji derdorên siyasî yên din in jî nikarin tev li xebatên *Grûba Kurmancî* bibin. Ji ber wê ye ku di nava çavkaniyên Bilbil-Baran (2008) û Zal (2009) de navê xebatên *Grûba Kurmancî* diyar nabe, digel ku di ber xebata termînolojiyê re gellek gotarên li ser rêzimana kurdî jî ji aliyê wê grûbê ve hatine çapkirin. Ji bilî Tan (2005), di nava çavkaniyên tu rêzimanan de behsa xebata *Grûba Kurmancî* nehatiye kirin. Hingê çavdêriya me ya sêyem jî dê ev be : « *dîwarên siyasî* » *rêyê li ber pêşketina xebatên zimannasiyê digirin*.

Celadet Bedirxan - HAWAR
baneşan
bêje
bîhnok
bilêvkirin
bilindek
bireser
daçek
dengdanî
dengdar
dengdêr
dunik
elfabe
gelejmar
gihanek
herf/tîp
herfên girdek
herfên hûrek
hevedudanî
hevenav
hêman
hoker
kemper/miqayese
kevanek
kît
komek/hevok
lêker
mêjer
mîsal
navdêr
nêr/mê/nêtar
niqte
niqteşanî
pirs
pronav
pronavên kesîn
pronavên kirar
pronavên îşarkî
pronavên xwemalîn
rawes
rengdêr
rengdêrên wesfîn
rêzan
serenav
tewang
tof
vekît
veqetandek
veqetandekên binavkirî
veqetandekên nebinavkirî
vêsih
yekejmar
zarê nivrowî

Encam

Di lêkolîneke bi vî awayî de çareserkirina pirsgirêkên bingehîn yê qada zimannasiya kurdî ne hêsan e. Lê belê em dikarin piştî xwe pispêrin peyva Jean-Paul Sartre ku digot « *nîşandayin guhertin e* » û bibêjin ku, weke ku me nîşan da, pirsgirêk gellekî ciddî ne, lewre êdî weha bûye ku zimannas bi xwe jî nikaribin ji hevdu fahm bikin.

Lê belê, ya jê girîngtir di fêrkinê de ye û ev pirsgirêkên termînolojiyê dikarin rêyê li ber bigirin ku xwendekar ji rêzimana kurdî fahm bikin. Lewre heger zimannas nikaribin ji hevdu fahm bikin, hingê rewş dê ji bo xwendekaran hê aloztir be û ev yek dikare bibe sedem ku baweriya bi rêzimanên kurdî jî kêmbibe.

Belê, termînolojiya zimanekî berhema lihevkirineke giştî ya li ser wî zimanê ye. Carinan hin dezgehên mîna *Akademiya Fransî* hene ku ji bo zimanê xwe peyvan pêşniyar dikin an jî ava dikin. Dibe ku ev dezgeh ne fermî jî bin, weke ferhenga *Robert* ya fransî ku her sal peyvên nû jî dinirxîne. Carinan jî hin lêkolînerên mezin hene ku termînolojiya ku wan bi kar aniye, piştî demekê dibe *termînolojiyê hevpar*. Weke mînak, Gilbert Lazard ku zimannasekî navdar yê zimanê îranî ye, di lêkolîneke xwe ya sala 1956'an de ku li ser zimanê tacikî kiribû, di jêrenotekê de behsa formekê dike û jê re dibêje *medyatîf*. Di salên 1990'î de, ev peyva wî ya wê jêrenota navdar êdî bû navê têgeha *medyatîfê* ku îroj jî herkes bi kar tîne.

Herçî kurmancî ye, kesê yekem ku bi kurdî xebatên rêzimanî kiriye Celadet Bedirxan e. Di tabloya kêlekê de, em dibînin ku digel ku hin peyvên termînolojiya Celadet Bedirxan piştî wî nehatine bikaranîn jî, em şopa termînolojiya wî di xebatên dema me de hê jî dibînin. Bi vî

awayî, em dibînin ku di 52 peyvên mînak de, bi qasî ku em dizanin, bi kêmanî 41 peyv hê jî ji aliyê zimannas û rêzimannasên kurd ve tên bikaranîn. Lê belê, weke ku tê zanîn, Celadet Bedirxan di kovara *Hawarê* de hin peyvên din jî ava kiribûn, mîna *dûrbîsk* (telefon), *wêneguhêz* (televizyon), lê dîsa jî ew peyv neketibûn nava zimanê kurdî, ji ber ku ji aliyê kesên din ve nehatibûn bikaranîn.

Yanî, kurt û kurmancî, çavkanî çî be jî, heta ku li ser peyvekê lihevkirineke giştî pêk neyê, mirov nikare bibêje ku *termînolojiyê giştî* pêk hatiye. Lê belê, dîsa jî, weke ku me destnîşan kir, li ser hin peyvên bingeîn lihevkirineke giştî diyar dibe. Ew peyvên hevpar jî bi pirranî ji *Hawarê* û *Bingehên Gramera Kurdmancî* ya Celadet Bedirxan tên. Ji ber ku Celadet Bedirxan rêzimana xwe bi dawî nekiriye û Roger Lescot ji dêleva wî ew rêziman bi dawî kiriye û çap kiriye, îroj em wê rêzimana ku Celadet Bedirxan dixwest amade bikiraya bi tenê bi zimanên biyanî dikarin bixwînin. Li gora beşên ku wî bi kurdî amade kirine, em têdigihîjin ku termînolojiya ku wî bi kar aniye, îroj hê jî bandora xwe li ser xebatên zimannasiya kurdî dike. Gava ku pêşniyara peyveke nû ji aliyê kesine din jî were pejirandin, hingê ew dibe *termînolojiya giştî*, heger na, ew peyv bi tenê di warê *termînolojiyê şexsî* de dimîne û têgihîştina ji wê termînolojiyê jî dê dijwar be.

Bi vî awayî, em dikarin di zimannasiya kurdî de *du qadên termînolojiyê* destnîşan bikin : *termînolojiya şexsî* û *termînolojiya giştî*. Ji bilî hin peyvên hevpar ku me di vê xebatê de destnîşan kirin, hemû peyvên din yê ku di tabloyên me de xuya dibin, dikevin qada *termînolojiya şexsî* û dikarin di têgihîştina ji hevdu de bibin sedema pirsgirêkên ciddî.

Divê em vê jî bibêjin ku ji ber ku dezgeheke kurdî ya zimanî tune, pirraniya zimannas û rêzimannasên kurdî jî beyî formasyoneke zimannasiyê û bêtir bi xwendinên rêzimanên biyanî dest bi lêkolînên li ser zimanê kurdî dikin. Ji ber nebûna perwerdehiya bi zimanê kurdî jî, pirsgirêkên lêkolînên kurdî her ku diçe bêtir kûr diçin. Xema zimannas û rêzimannasên kurdî dikare bi sedemên xwe yê dîrokî û civakî were fahmkirin û divê keda wan jî kêr neyê dîtin. Lewre, di dewreke weha de ku zimanê kurdî qedexa bû û perwerdehiya wî nebû, rêzimanên kurdî an jî metodên fêrbûyina kurdî ku hatine amadekirin, diketin şûna dibistanan. Pirsgirêka ku di vê xebatê de hatiye behskirin, bi tenê pirsgirêka wan ya termînolojiyê ye an jî pirsgirêka *binavkirina têgehên zimannasiyê* ye. Lewre bikêrhatina wan nikare were nîqaşkirin.

Em dikarin çavdêriyên vê lêkolîna xwe weha dubare bikin :

- 1- Ji ber ku perwerdehiya kurdî bi awayekî giştî nebûye, zimannas û rêzimannasên kurdî bi pirranî beyî formasyona zimannasiyê û bi xemên kurdayetiyê dest bi xebatên xwe kirine.
- 2- Ji ber ku dezgeheke zimanê kurdî tune, zimannasên kurd hewl didin ku pirsgirêkên zimanê xwe û pirsgirêkên termînolojiyê bi xwe çareser bikin ku ev helwêst pirsgirêkê mezintir û tevlihevtir dike.
- 3- Lêkolînerên zimanê kurdî xebatên berî xwe baş naxwînin û baş nanirxînin û ev jî rêyê li ber wan digire ku ji xebat û lêkolînên berî xwe îstifade bikin. Bi vî awayî, rê li ber pêşketina zanistiya kurdî jî tê girtin.
- 4- Dîwarên siyasî di nava lêkolînerên zimanê kurdî de hatine avakirin û danûstendinên lêkolîneran bi tenê di nava derdor û civakên siyasî de pêk tên ku ev jî dibe pirsgirêkeke ciddî.
- 5- Ji ber van pirsgirêkên jorê, îroj di qada zimannasiya kurdî de *termînolojiyeke şexsî* li hember *termînolojiyeke giştî* peyda bûye û her lêkolîner li gora xwe termînolojiyeke nû ava dike.
- 6- Pirsgirêkên termînolojiyê rêyê li ber digirin ku zimannasên kurdî ji hevdu fahm bikin. Ji bo xwendekar û şagirtên rêzimana kurdî, ev rewş pirsgirêkên perwerdehiya rêzimana kurdî jî peyda dike.
- 7- Ji bo çareseriyê van pirsgirêkan, divê lêkolînerên kurd bi awayekî acîl li hev bikin ku *Dezgeheke Zimanê Kurdî* were damezirandin û ev dezgeh ji hêz û rêxistinên serbixwe be û, beyî ku guh bide cudahiyan bîrdozî, bibe bingeheke peywendiyên lêkolîneran û bikare biryaran li ser pirsgirêka termînolojiyê û pirsgirêkên din yê zimannasiya kurdî bide.

Çavkanî :

- AHMAD Subhî (2003), *Pirtûka Rêziman: zaravayê kurmancî*, Almanya: Most Verlag, 199 r.
- AKRAWY (1982), « Tense of the verb » in *Standard Kurdish Grammar*. (Cf: <http://www.xs4all.nl/~tank/kurdish/htdocs/lang/Burhan/77.html>)
- AMOURETTE Céline (2004), *Expression du temps et de l'aspect dans les formes non conjuguées du français*, t. I-II, Thèse de doctorat à l'Université de Rouen, 605 r..
- ARISTOTE, *Traité du Temps, Physique*, livre IV, 10-14, Paris : Kimé, 1994, 124 r.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2006a), *Temps, subordination et concordance des temps en kurde : étude descriptive sur le système verbal du kurmandji, (Dem, hevokên pêreyî û lihevkirina deman di kurdî de)*, teza doktorayê, Zanîngeha Rouenê.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2006b), « Di kurmancî de sîstema deman » in *Zend* n° payiz Istanbul, rr. 3-17.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2006c) « Identification des temps verbaux dans les grammaires kurdes » pp. 189-220 in *World Congress on Kurdish Studies : actes du colloque.- Kurdistan-Hawler :University of Salahaddin*.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2007), « Kurmanciya malperên kurdî û zimanê rojnamegeriyê » in *Çirûsk* n° 1, Diyarbekir, rr. 51-58.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2008), « Les constructions ergatives dans le roman kurmandji », *Etudes Kurdes*, n° 10, rr. 65-82.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2009), « Médiatif : résurgence du système verbal du kurde kurmandji » pêşkêşî *Colloque Chronos-09* bûye, 2-4 îlon 2009, Université Paris VII, Paris.
- AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2010), « Guman : Pîrozî, avakirina neteweyan û wêje », in *Le Monde diplomatique kurdî*, n° 12, çiriya pêşîn 2010.
- BADILLI (1965), *Türkçe izahli Kürtçe Grameri : Kurmancça Lehçesi*, Ankara : Ankara Basim ve Ciltevi, 192 r..
- BARNAS Rojen (1993), « Kişandin û navlêkirina deman » in *Kurmancî*, n° 12, r. 5.
- BARRAL Marcel (1980), *L'imparfait du subjonctif : étude sur l'emploi et la concordance des temps du subjonctif*, Paris : A. & J. PICARD, 627 r..
- BEDIRXAN Celadet (Mîr Hereqol Ezîzan) (1932), *Rêzana Elfabêya Qurdî* : note sur l'alphabet kurde, Şam : çapxana Terekî, 20 r.
- BEDIR KHAN Emir Djeladet Ali & LESCOT Roger (1991), *Grammaire kurde: dialecte kurmandji*, Paris: Jean Maisonneuve, 372 r.
- BEDIR-XAN Celadet Alî (1998), *Elfabêya kurdî: bingehên gramera kurdmancî*, Istanbul : Doz, 112 r.
- BEDIR-XAN Kamran (1971), *Rêzana Zmanê Kurdî*, Parîs, çapa şexsî, 68 r. (çavkanî : pirtûkxaneyaya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê)
- BEDIR-XAN Kamuran (1974), *Türkçe izahli Kurtçe gramer*, Stockholm : Ozgurluk Yolu, 85 r.
- BEDIR KHAN Kamuran (1989), *Le kurde sans peine: cours pratiques de la langue kurde*, Paris : Institut Kurde de Paris, 206 r.

- BÊKES Kamiran (2004), *Bingehên Rêzimana Kurdî* : Zaravê kurmanciya bakur, Osnabruck (Allemagne) : Babol Druck, 377 r.
- BENVENISTE Émile (1966), *Problèmes de linguistique générale*, vol. I, Paris : Gallimard, 356 r.
- BILBIL Mikaîl & BARAN Bahoz (2008), *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol : Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 144 r.
- BLAU J. & BARAK V. (1999), *Manuel de kurde: kurmanji*, Paris: L'Harmattan, 225 r.
- BRUNOT Ferdinand (1953, 1^{ère} éd. 1922), *La Pensée et la Langue* : méthode, principes et plan d'une théorie nouvelle du langage appliquée au français, Paris : Masson et Cie, 982 r.
- BURKAY Kemal (Baran) (1997), *Dersên zmanê kurdî* : türkçe izahli kürtçe dil dersleri, Istanbul : Deng, 5^e éd., 167 r.
- BOZKURT Aynur (2008), *Kesandina lêkerên kurmancî*, Stenbol : Doz, 313 r.
- CIWAN Murad (1992), *Türkçe açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi: Kurmanc lehçesi*, Balinge (Swêd): Jîna Nû, 224 r..
- ÇELIKER Celadet (1996), *Çend Pirsên Alfabeya Kurdî*, Stockholm : Roja Nû, 173.
- DE BOTH-DIEZ Anne-Marie (1985), « L'Aspect et ses implications dans le fonctionnement de l'imparfait, du passé simple et du passé composé au niveau textuel » in *Langue Française*, n° 67, rr. 5-22.
- DEPECKER Loïc (1991), « Les enjeux de la terminologie », *Universalialia*, Thèmes et problèmes, Paris, rr. 302-304.
- DE SAUSSURE Louis (2003), *Temps et Pertinence* : Élément de pragmatique cognitive du temps, Bruxelles : de boeck.duculot, 321 p.
- DIRÊJ EVDILA (2008), *Kurdî kurmancî I: pirtûka xwendinê*, Berlîn : Weşanên Dilop, çapa duyem, 157 r.
- FRANÇOIS Jacques (2003), *La prédication verbale et les cadres prédictifs*, Louvain-Paris : Peeters, 417 r.
- GOSSELIN Laurent (1996), *Sémantique de la temporalité en français* : Un modèle calculatoire et cognitif du temps et de l'aspect, Louvain-la-Neuve : Duculot, 291 r.
- GOSSELIN Laurent (1999), « La cohérence temporelle : contraintes linguistiques et pragmatico-référentielles » in *Travaux de Linguistique*, n° 39, rr.11-36.
- GOSSELIN Laurent (2003), « Observation linguistiques sur l'irréversibilité du temps » in *Revue de Sémantique et Pragmatique*, n° 14, rr. 7-31.
- GOSSELIN Laurent (2005), *Temporalité et modalité*, Louvain-la-Neuve : Duculot, 254 r.
- GUILBERT Louis (1975), *La création lexicale*, Paris : Larousse Université, 285 r.
- GUENTCHEVA Zlatka (1994), « Manifestations de la catégorie du médiatif dans les temps du français » in *Langages*, n° 102. rr. 8-23.
- GUENTCHEVA Zlatka (2004), « La notion de médiation dans la diversité des langues » rr. 11-33 in DELAMOTTE-LEGRAND (dir.), *Les médiation langagières* : des faits de langue aux discours, vol. I, Actes du colloque international, la médiation : marquage en langue et en discours, Rouen : Publication de l'Université de Rouen, DYALANG, CNRS, 427 r.

GUILLAUME Gustave (1968), *Temps et Verbe* : théorie des aspects, des modes et des temps, suivi de *l'Architectonique du temps dans les langues classiques*- Paris : Librairie Honoré Champion, 134+66 r.

HACO Zerdeşt (1982/2002), « Dem di Kurmaciya Bakur de » in *Hîwa*.

INCEKAN Abdullah (2009), *Ez Kurdî hîn dibim* : Pratîk Kurtçe Dersleri, Stenbol : Nûbihar, 263 r.

JEMO Mamed (1991), *Le système verbal et la conjugaison des verbes kurdes* : La Bescherville Kurde, Paris, (Neçapbûyî. çavkanî: Pirtûkxaneya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê).

JEMO Mamed (1995), *Eléments de la grammaire kurde* : kurmandji, Lille, çapa şeşsî, 138 r.

JESPERSEN Otto (1971), *La Philosophie de la grammaire*, Paris : Minuit, 513 r.

KARTAL Huseyin (1992), *Das kurdische verbum*: eine kontrastive Darstelluy mit dem irani.

KLUM Arne (1961), *Temps et adverbe*, Stockholm, Göteborg, Uppsala : Almqvist & Wiksell, 313 r.

KOZLOWSKA Monika (1998), « Aspect, modes d'action et classes aspectuelles » rr. 101-121 in MOESCHLER Jacques (berpirsiyar), *Le temps des événements* : Pragmatique de la référence temporelle, Paris : Kimé, 348 r.

KURD Reşîd (2006), *Rêzimana Zimanê kurmancî*, Şam: Dar El zaman, 123 r, çapa duyem (çapa yekem : 1956).

KURDO Qanatê (1990), *Gramera zmanê kurdî*: kurmancî, soranî, Bromma: Roja Nû, 335 r.

KURMANCÎ : n° 1-40, 2010, Stenbol : Avesta

MARTIN Robert (1971), *Temps et Aspect* : essai sur l'emploi des temps narratifs en moyen français, Paris : Klincksieck, 450 r..

MARTIN Robert & NEF Frédéric (1981), « Temps linguistique et temps logique » in *Langages*, n° 64, rr. 7-20.

MOESCHLER Jacques (1993), « Aspects pragmatiques de la référence temporelle : indétermination, ordre temporel et inférence » in *Langages*, n° 112, rr. 39-54

MOKRI Mohammad (2002), « La morphologie du verbe kurde », in *Journal Asiatique*, n° 290.1, rr. 31-52.

MOLENDIJK Arie (1985), « Point référentiel et imparfait » in *Langue Française*, n° 67, rr. 78-94.

MOLENDIJK Arie (1993), « Présupposition, implication, structure temporelle » rr. 167-191 in VETTERS édit., *Le temps, de la phrase au texte*, Lille : R.U. de Lille.

OMER EHMED Bayiz (2002), *Tens li diyalekta jorî ya zimanê kurdî li govera Badinî*, lêkolîna masterê ya sala 1999'an ku li Zanîngeha Selahaddîn hatiye parastin, Dihok: Çapxaneya Dihokê, 2002.

ONEN R., TAN S., AYKOC M., VARLI S. (2009), *Hînkêr* : Asta yekemîn, Stenbol : Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, çapa sêyem, 112 r.

OZEL Çeto (2000), *Kurdiya Nûjen* : ji bo hîndekariya ziman, Stenbol : Enstîtya Kurdî ya Stenbolê, 139 r.

- PINCHON Jacqueline (1974), « L'homme dans la langue, l'expression du temps » in *Langue Française*, n° 21, rr. 43-54.
- REY Alain (1979), *La terminologie noms et notions*, Que sais-je ?, Paris : PUF.
- RIZGAR Baran (1993), *Uygulamali Kürtçe Dersleri: Dersên Kurdî*, London : Lithosphere, 391 r..
- SABANEEVA Margarita (1993), « Mode verbal et problèmes connexes : essai d'une formule nouvelle » in *La linguistique*, fascicule 1, volume 29, rr. 55-65.
- SAGNIC Feqi Huseyn (1991), *Hêmana Rêzimana Kurdî*, Istanbul : Melsa, 240 r..
- TAN Sami (2000), *Waneyên rêzimanê kurdî*, Istanbul: Welat, 190 r.
- TAN Sami (2005), *Rêziman û Rastnivîsîna Zaravayê Kurmancî*, Istanbul: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 352 r..
- VET Co (1980), *Temps, aspect et adverbess de temps en français contemporain : essai de sémantique formelle*, Genève : Droz, 185 r.
- VET Co (1981), « La notion de 'monde possible' et le système temporel et aspectuel du français » in *Langages*, n° 64, rr. 109-124.
- VET Co (1985), « Univers de discours et univers d'énonciation : les temps du passé et du futur » in *Langue Française*, n° 67, rr. 38-58.
- VETTERS Carl (1993), « Temps et Deixis » rr. 85-115 in VETTERS (berpîrs.), *Le temps, de la phrase au texte*, Lille : R.U. de Lille.
- VETTERS Carl (1996), *Temps, aspect et narration*, Amsterdam-Atlanta : Rodopi, 216 r.
- VOGELEER S. (1994), « Le point de vue et les valeurs des temps verbaux » in *Travaux de linguistique*, n° 29, rr. 39-57.
- WEINRICH Harald (1964/1973), *Le Temps : le récit et le commentaire*, Paris : Seuil, 330 r.
- YALÇIN Evin (2000), *Etude comparative de six grammaires récentes sur le système verbal en kurde*, mémoire de DREA à l'INALCO.
- YALÇIN Evin (2001), *La morpho-syntaxe du verbe kurde*, mémoire de DEA à l'Université de la Sorbonne Nouvelle- Paris III.
- YVON H. (1951), « Convient-il de distinguer dans le verbe français des temps relatifs et des temps absolus ? » in *Le Français Moderne*, n° 19, rr. 265-276.
- ZAL Azad (2009), *Zimanê kurdî*, Stenbol : Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 238 r.
- ZILAN Reşo (1989), « Reformek Pêwîst e » in *BERGEH*, n° 1-6.